Pîrozbahî…

Vekirina beşê kurdî di malpera Ragihandina Şamê de Pîroz be!!

***Rêberê Silîvî**

Vekirina beşê kurdî di malpera fermî ya " **Ragihandina Şamê ji bo guhertina demokratîk** " de, gaveke hêja û balkêş e, ew ji bo ziman û çanda kurdî destkefteke pîroz e. Bi vebûna vî beşê ku ji hêla rewşenbîr, nivîskar, lêkolîner û helbestvanên kurd ve gerekê piştgirî û arîkariyê ye, dê çanda netewî ya giştî, çanda hemdem, çanda hezkirina mirov û mirovatiyê geş bibe û roniyê bibîne.

Tiştê mirov matmayî dihêle ewe ku destelata Sûriyê ji şûna ku piştgiriya ziman û çanda kurdî bike, rê li pêş geşbûna wî dûz bike, weke beşekî ji ji çanda netewî ya Sûriyê lê temaşe bike, bi her hawî ew xebitiye, hê jî dixebite ku vî zimanî biqurmiçîne, pûç bike, rehên wî ji singa gelê me hilqetîne, wî ji hole rake û zimanê Erebî bi dare zorê li şûna wî cîwarbike..!!

Lê, tîrêjên çanda mirovatî û mafên mirovan li seranserî cîhanê hêdî hêdî, vê nerîna çewta ne mirovane dide ber xwe û ji cîhana mirovatiyê bidûr dixîne, îro nivîskar, rewşenbîr û siyasetvanên hişmend ên Ereb, Asûr, Ermen…û ên dîtir, têgihane ku kuştina zimanekî netewî, kuştina beşekî ji çand û wêjeya netewî ya Sûriyê ye!..

Bera li ser xaka welatê me Sûriyê, ziman û çanda hemî gel û kêmnetewyên sûrî li kêleka hev bi aştî û biratî bijîn, hemî geş bibin û pêşve herin, çanda netewî şax vede û hemereng bibe, bibe cihê serbilindî û serfiraziya me hemiyan.

Bi hêvî û omîd im ku rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên me yên kurd, bi pênûs û berhemên xwe yên delal vî beşê nûhatî dewlemend û zengîn bikin, ala azadî, aştî û wekheviyê bilind bikin.Serketin û serfiraziyê ji karê we yê pîroz re dixwazim. **Qamişlo**

Dumahî: Ji heftenameya… çareserdibêt…?

B7- Ew banga Erdogan zor erênî û baş bû , eger karîba lê biba xwedî, û li gorî naveroka wê bangê, siyseta hukûmeta xwe bida meşandin . Li hêla dî, çêroka ku (li ser daxwazan) şer raweste , agirbest be, anjî (li ser daxwezan) şer nû bibe û agir gur be, li ba mirov ne zelal e û baş fêm na be. Di baweriya min de, duh jî, evro jî, çendî ji alî kurdan ve agirbest bidome , û heyameke aştiyane li saz be , ewqas rê li ber çareserkirina pirsgirêkan vedibe. Û çendî kuştin û şerê xwînî li dar be, ewqas girêk mezin dibin , derd û kul pirtir dibin , bar û metirsî girantir dibin …Rê jî dikeve sergermî û bazirganiya bi pirsa kurd û pêşeroja Turkiyê û herêma Kurdistana Îraqê.

8- Eger axiftinên we cuda hebin yan bangewazîyên we jib o raya giştî Kurdistan bi fermon…

B8- Dixwazim bêjim em gelekî bi hewcey lêkolînên zanistî û ekadimîk in , da ku em xwe û derdorên xwe baştir nas bikin , ji ber ku, bi rastî jî, pirsa gelê me yê kurd çi li vir, çi li wir, pirseka mezin e , ji partiyan û serokan mestir e, û em bivên nevên, çareserkirina vê pirsa netewî, ya dadmend û mirovane , wê di çerçewa rêzgirtina sînorên navdewletî yên heyî de serê xwe bibîne . Dem hatiye guhartin û bi lez dibore.

Sipas ji xwedî û karmendên Çawdêr re.

2-11-2007an

Sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê.

Birayê we

Mihyedîn Şêx Alî